Derçûn ji desthelata manayê

Hoşeng Şêx Mihemed

Rexne û wate

Her di wê qonaxê de, erkê rexnê jî, ew bû ku têkistên kehî, kehîtir lê bike, hêş pitir û pitir sade bike û cemawer bi sanehîtir têbigehe, xwendingehên rexneyî ku yek ji wan jî nekurdî ye bi hemû rengan hewil didan, wateyên siyasî û neteweyî, civakî û nîştmanperweriya wan têkistan bo xelkî rave bikin, deqên ku piranî girtî bûn û çi rave û tefsîrên cuda qebûl nedikirin, rexne da bihê pitir wateyên wan aşkira bike, anku rexne jî bi tinê bo bi sanehî xwandina wan têkistan berhem dihat ku pêwîst jî nebû. Lê diyare binemaya siyasî li pişt vê çendê rawestiyabû, rexne jî wek wan têkistan girtî bû û hewil dida şanaziyên helbestvanî, welatparêzî û xweş miroviya wî nîşan bide, yan berûvajî bê helwîst û bi kêr nehatiya wî.

Di vê qonaxê de wateyên diyar û aşkira pêwîstiyek serekî bû ku berhem bibe helbestek cemawerî û cemawer jî kar lê bikê li gel bike, desthelata wateyî bê sinor bi ser cemawerî zal bû ku rexne jî nedişiya xwandinekê gûmankî bo wan berheman bike.

Diyare gûmana rexneyî li dûv wan xwendingehên ne kurdî û kevinî la û teysokên wî nivşî bawerî pê hebûn û heta evroke jî dunya, helbest û edebê pê dibînîn, wê gavê heger gûmanek di rexnê de heba, eve bo vê çendê bû, da gûmanê ji kurdperwerî û exlaqa helbestvanî bike û rexna hindî bigire ku helbestvan, bo milletî nanivîse û pêgîr

nîne bi meselên neteweyî.

Anku rexne jî da bihê pitir û pitir desthelata wateyê di têkisitî de bi hêztir bike, têkist jî pitir û pitir ji helbestî û ciwankariyê vala dike û daxwaza berhemên resen, armancadar û mebestgeran dike.

Rexna helbestî jî, berhemê heman binemaya siyasiyên wan deqan bû, anku wan deqan, yan eqliyeta rawestiyayî li pişt wan deqan, heman cûrê rexnê jî berhem hîna, anku verêja berhemên wan xwedavendan, rexneka sade û sakartir bû ji deqan bi xwe?.

Ji ber vê çendê jî, di vê derê de ez tekîdê li ser vê çendê dikem ku ew berhem karîgeriyek silbî li ser rexna helbestî û edebî bi giştî jî kir. Çunke ew zemîne xweş nekir da deqên rexneyî ji dayik bibin bişên ravek, yan xwandinek cuda li ser wan berheman pêşkeş bikin,

Ew deq, deqên girtî bûn, sîstema hiziriya wan deqan jî sîstemek girtîbû û bi dîtinek siyasî, yeqînî, yekrehend, helbest kirine berhemên girtî.

Heger evroke em hindek rexnên nû bibînîn ku bi rêbazeka nû ya hevçerx wan berheman bixwînin, bi baweriya min, xapandinek edebiye, ne wek rexnek edebî, çunke deq, verêja xwe ya siruştî dirêje û berhem dihîne, ne wek rexne, verêjên xwe li ser deqekê helbestî birêje û berhem bihîne, diyare ya diwê jî çêdibe, wek ew mamostayên ekadîmî pêgîr binema û qanunên neguhur di edebî de dikin û dişên hemû têkistan bikene di qalibên rexneyên nekurdî û hazir de, lê diyare ev çende li ser xwandevanan zîrek re derbaz nabe.

Çunke mesele di vê derê de girêdayî wî sîstema hizirkirinêye, ewa berhemê helbestî xeliq dike, ne wek ew xwendingeha edebî ewa helbestê pê dixwîne.

Ew berhemê ji verêja siyasetê çêdibe, diçe dunya xwe ya siruştî ku siyasete.

Ew berhemê ji verêja felsefê çêdibe, diçe dunya xwe ya xweristî ku felsefeye.

Ew berhemê ji verêja hizirî çêdibe, diçe dunya xwe ya xweristî ku hizire.

Ew berhemê ji verêja ruhî çêdibe, diçe dunya xwe ya resen ku ruhe.

Ew berhemê ji verêja helbestê çêdibe, diçe dunya xwe ya gewherî ku helbeste.

Ji ber vê çendê, rexne neşê wan sîsteman li me berze bike û verêja siyasetê bibete dunya helbestê. Her wek çewan neşê jî verêja helbestî bibete dunya siyasetê, anku rexne. Ne dişê têkistên siyasî bi zorî bikete helbest û nedişê jî helbestê bi zorî bike siyaset, anku

guhera berhemî, dibe verêja wate, rexnê, ravekirin û xwandinê, ne wek qalib û çarçovên rexneyî.

Di vê derê de eqliyet, sîstema hizirkirinê, dunya dîtin, têgehiştina nivîserî destnîşana deqên vekirî û girtî dike.,Çunkî ew sîstem û eqliyet, mana û bihayan dibexşe çemkan. Piştî wî peywendiya nivîserî bi wan çemkan diyar dike.

Nivşa sereta, heftiyan, heştiyan û piştî serihildanê jî, xwedan sîstemên hizirên cudane. Heger taqma êkem, sîstema wan ya hizirî dînî be, eve ya duwê siyasete û ya sê hem jî renge hemereng be, hem dînî, hem siyasî, hem hizirî û hem ruhî jî be, anku nivşa nû, vê gavê li gel sîstemeka din ya hizirkirinê û dîtinê, sewdayê li gel helbestî dike, sîstemek ku zengîntir, berfirehtir û mezintire.

Di vê derê de min divê amajeyî bi vê çendê bidem ku hemû deqên binema dînî, yan siyasî, ne merce, deqên girtî bin. Rexneya hevçerx neşê bixwîne, nexêr diyare mebesta min eve nîne, çunke gelek deqên binema dînî û siyasî hene, qabîlî xwandinên cûrawcûr û hemerengin. Lê pêwîste em bizanîn, Ev mesele girêdayî dîsan sîstema hizirkirina wan nivîseraye, ewên xwe nekirîne xwedavend li ser têkistî û deq bi wateyekî diyar û aşkira dorpêç nekiriye. Belkî tijî amajên felsefî, hizirî, ruhî û helbestî kirîne.

Anku demê em behsî sîstema hizirkirinê dikin, mebest ewe ku di deqî de em çend dişên ji bilî binemayên dînî û siyasî, binemayên mirovayetî, hizirî, ruhî û helbestî bibînîn? Rexne çend dişê di nav wan binemayan de bigere û tiştan keşif bike?

Anku ne merce demê em Nalbendî dixwînîn bo nimûne, hemû gavan me ji xwedê û heqîqetên reha nêzîk bike, belkî hindek gavan me ji ruhî nêzîk bike,?

Anku di vê derê de, wateyekî dide me ku renge binema dînî nebe, ya felsefî be, anku desthelateka reha ya watey di têkistî da nebe, belkî azadiyek hebe bo xwandinên cuda cuda.

Lê diyare ev azadiye jî, azadiya têkistî, verêja sîstema hiziriya azada helbesvaniye, anku her çende Nalbend xwedan binemayek dîniye di berhem, helbest û hizirên xwe de. Lê dîn li cem wî ne ew têgehiştine ku gûman û pirsan li cem bikuje. Eve li gel berhemên siyasî jî her diruste demê, siyaset neşê nivîserê azad, kehî bike û ruha yaxîbûnê li cem bikuje û pirs û gûmanan li cem nehêle. Her wek çewan felsefe û hizir jî neşên mirovî bigehîne heqîqetên reha û hemû nihêniyan bo aşkira bikin.

Diyare, dîsan tekîd dikem ku deq, têkist, berhemê helbestî, bi tinê ew dişê rêkê bide me bi azad, yan girtî, dahêner, yan nedahêner,

xwedan zimanek zengîn û medlûlat, yan berûvajî nîşanî me bide, vêça çi deqek be berî rojekê ji dayik bûbe, yan berî sedan salan.

Anku helbest, li gel hebûna mirovan hebûye û li gel rexna hevçerx ji dayik nebûye, helbest ruha miroviye, beşekê giringe di sîstema hizirkirina mirovî de.

Deqên dahêner jî, yan bibêjin baştirîn berhemên helbestên dahêner jî ewin, ewên helbest û peywendiya mirov û çemkan bi helbestê rave dike.

Helbest, revîneka berdewame, ji wateyên heqîqî, ji heqîqetên reha û bersivên yeqînî, geryane di nav gûman û nihêniyan, sîstema hiziriya helbestî jî pitir şiyaye ji wan pirsan nêzîk bibe, pitir ji dînî, ji zanisitî û ji siyasetê, renge ji ber vê çendê jî heta vê gavê wesan xuya be ku dîn, zanist û siyasetê pitir karîgerî li ser çarenivîsa mirovan hebûbe. Çunke ew berdewam bersivan didene mirovan, berdewam pirsan li cem dikujin û yeqînan pêşkeş dikin. Berûvajî helbestê ku berdewam pirsan çêdike û bersivên yeqînî jî berhem nahîne. Berdewam mirovî ber bi tariyatiyê û nezanînê de dibe. Berûvajî kayeyên dî, ji ber vê çendê jî, berdewam cemawera dînî, siyasetê û zanistî ji ya helbestê pitire, renge berdewam jî helbest, babetek be, bibe qurbanî bo dîn, siyaset, zanist, civak, felsefe û binemayên din. Lê diyare jî serbarî vê çendê hemûyê helbest berdewam bûye û gehiştiye evro, evroke jî wek mêjû ku dişên bi qûnaxa piştî serhildanê nawidêr bikîn. Li hember asoyek gelek berfireh xwe çalak dike û xerîke helbest bo xwe binemayek helbestî, ruhî çêdike û berhemên helbestî jî roj bi roj zêdetir ji dayik dibin û dengên cûrawcûr û cuda cuda jî peyda dibin,

Anku sebaret bi kurdan û bi taybetî li deverê ji nû dengên helbestî peyda dibin û helbest jî dibe kayeyek çalak û berhemdar ku renge baş be ez bibêjim, berûvajî ewên dibêjin helbest wê bimire ez dibêjim, helbest ji nû ji dayik dibe û xerîke duniya me ya hizirî, felsefî, dînî û siyasî, bi helbestê reng bike û çalakane karîgeriyê li ser rewşenbîriya deverê çêbike.

Heta niho renge dîn û siyasetê bi rêka helbestê mumaresa karîgeriya xwe kiribe li ser civakî, ez dibînim eve xerîke vê gavê helbest jî her bi rêka helbestê mumaresa karîgeriyek taybet bike. Bi baweriya min destpêke, çendîn deng û reng jî, hatîne meydanê û hêdî hêdî helbest ji dayik dibe.